Hejmara 182

# MIZGÎN

Bê dirav e

15-NÎSAN 2025



# Naverok


1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

13 Bixwînin û fêr bibin

14 Wêne û tablo



Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Cîhan Isma'îl
Baran zagros

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Kovara Mizgîn
مجلة مزكين

Kovara Mazgîn

Renkirina wêneyê firindeyê **Tewqan** wekî di ya wêneya rengkirî de, temam bikin

**أكمِلْ تلوينَ صورةِ طائرِ الطُّوقانِ كما في الصُّورة.**





# KEKÊ

*Kekê minê pir delal*
*Hem bira ye hem heval*
*Pir şîrîn in reng û çav*
*Bejn û bal û deng û nav*
*Rojên cejn û newroza*
*Mîna ba û bahoza*

*Bo min tîne gilyaza*
*Wek ristik û gilwaza*
*Şîv û taştê diçim cem*
*Xwarnê tev de dixwin em*
*Di hêlan û lîstoka*
*Geşt û seyran û sûka*
*Hev re dikin dîlanê*
*Bi helbest û lîlanê*

**Diyar Bohtî**



Her çar cudahiyên di navbera herdu wêneyan de bibîne

أَوْجدِ الفُورُوقَ الأرْبعةَ بين الصُّورَتَينِ.





## NEBÎ HORÎ....GENCÎNEYEKE DÎROKÎ YE

Silav hevalno! Ma hûn ji lêgerîna cihên kevnar û bihîstina çîrokên balkêş hez dikin? Bi me re werin bajarê Nebî Horî, ku dikeve bakurê Sûriyê, nêzîkî Efrînê ye û ew herêmeke ku Kurd bi sed salan lê dijîn!

Ew bajarekî pir kevnar e, temenê wê ji 2300 salî zêdetir e! Ew ji aliyê Yewnaniyan ve hatiye avakirin û navê wê “Cyrus” bûye, lê bi demê re hatiye guhertin û bi navê Nebî Horî hatiye naskirin.
Tê de keleheke mezin, dikeke şanoya a kevnar û pireke keviri heye. Zaniyarên kevneşopiyan pereyên zîv û guldankên kevnar li wir dîtin. Ev nîşan dide ku ew bajarekî girîng bû!



## النَّبِيُّ هُوري – كَنزٌ منَ التَّاريخِ

مرحبًا يا أصدقاءُ! هلْ تحبُّون استكشافَ أماكنٍ قديمةٍ، وسماعَ قصصٍ مشوّقةٍ؟ تعالَوا معنا إلى مدينةِ النَّبيِّ هوري، التي تقعُ في شمالِ سوريا، قُربَ عفرينَ، وهي مِنطقةٌ، عاشَ فيها الأكرادُ منذُ مِئاتِ السِّنينِ!
إنَّها مدينةٌ أثريَّةٌ قديمةٌ جدًا، عُمرُها أكثرُ من 2300 سنةٍ! بناها الإغريقُ، وكان اسمُها "سايروس"، لكنَّها تغيّرت عبرَ الزَّمنِ، وأصبَحتْ تُعرَفُ باسم النَّبيِّ هُوري.
فيها قلعةٌ ضخمةٌ، ومسرحٌ قَديمٌ، وجِسرٌ حَجريٌّ، ووجدَ علماءُ الآثارِ عِملاتٍ ومَزهرياتٍ قديمةً فيها؛ ما يَدلُّ على أنَّها كانت مدينةً مهمَّةً!





# Tu dizanî?

# هل تعلم؟

**Pisîkên Wanê** ne pisîkên asayî ne! Ew bi pora xwe ya spî û çavên rengîn navdar in! Hin ji van pisîkan rengê çavekî wan şîn e û rengê çavê din jî zer e. Ev yek jî wan di cîhanê de bêhempa dike. Ew ji avjeniyê hez dikin, berovajî piraniya pisîkên din. Ew ji avê hez dikin û bê tirs di nava avê de dilîzin. Ev cureyên pisîkan li Wanê wekî genceniyê ne û şênî bi baldarî wan diparêzin. Ji ber ku ew beşek ji mîrasa wan a bedew e.

أنّ **قِططَ وانَ العجيبةَ** في باكورَ كردستانَ ليست عاديةً أبدًا! فهي مشهورةٌ بِفرائهَا الأبيضِ النّاصعِ وبعينينِ لونهما مختلفٌ!
وبعضُ هذه القطط تمتلكُ عينًا زرقاءَ، وأخرى صفراءَ؛ ما يجعلُها فريدةً من نوعِها في العالم!
وهيَ تحبُّ السّباحةَ عكسَ مُعظمِ القططِ!، وهذهِ القطط تَستمتعُ بالماءِ، وتلعبُ فيهِ دونَ خوفٍ!
وتَعدُّ كنزًا في مدينةِ وان، ويحميها السّكّانُ بعنايةٍ؛ لأنّها جُزءٌ من تُراثهم الجَميلِ.

# *Hevala me Roj*

# صديقتُنا الشَّمسُ



Roj her dem hevalê me yê dilsoz e! Ew vîtamîna D dide me ku hestiyên me xurt û saxlem dike! Lê tîrêjên rojê pir bi hêz in, ji ber vê yekê girîng e ku em kom û berçavikên rojê li xwe bikin da ku çavên xwe ji ronahiya tund biparêzin.

Her gav ji bîr nekin: Ger hûn ji dîmenê rojê hez bikin jî rasterast lê nenêrin!

Ji ber vê yekê hevalno, bela kêfa we ji rojê re berdewam bike, lê bi zanebûn xwe biparêzin!

دائمًا الشَّمسُ صديقتُنا الوفيّةُ! فهي تمنحنا فيتامينَ (د)، الذي يجعلُ عظامَنا قويةً وصحيّةً! لكنّ أشعّةَ الشّمس قويّةٌ جدًا، لذلكَ من المُهمّ ارتداءُ قبّعَة، ونظّارات شمسيّة لحماية عُيوننا من الضّوءِ الشّديد.

وتذكّرْ دائمًا: لا تنظرْ إلى الشّمسِ مباشرةً، وإنْ أعجبَكَ منظرُها!

لذلكَ يا أصدقاءُ، ابقَوا مُستمتعينَ بالشّمس، لكنْ احمُوا أنفسَكم بذكاءٍ!

Hevalên hêja, tîpên kêm temam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan temam bikin.





# Helbestvan Kurde Neqişbendî

# الشّاعرةُ كورده نقشبندي

Ew di sala 1930'î de li gundekî bedew ê ser bi Helebceyê ve hatiye dinê. Bavê wê Kaka şêx bû. Piştî mezin bû fêrî xwendin û nivîsandinê bû. Rêwîtiya wê ya bi helbestê re di salên 60'î de dest pê kir, dema ku wê helbestên xweş li ser hezkirina welat û aştiya di nav mirovan de nivîsand. Ew ne tenê helbestvan bû, herwiha ew endama Yekîtiya Jinên Kurdistanê bû û ji bo mafên jinan xebat dikir.

Ji sala 1974'ê ve ew di navbera Îran û Norwêcê de bi cih bûye, lê wê welatê xwe ji bîr nekir, lewma di sala 2008'an de vegeriya Kurdistanê. Di 3'ê Adara 2015'an de helbestvan Kurde Neqşibendî koça dawîç kir û li gundê Tiwêle hat oxirkirin.

وُلدت سنة 1930 في قريةٍ جميلةٍ قربَ حلبجةَ. كانَ والدُها السَّيد كاكه شَيخاً، وعندما كَبُرَتْ، تعلَّمتِ القراءةَ، والكتابةَ رغمَ كُبرِ سنِّها! رحلتُها مع الشِّعر بدأتْ في السِّتينياتِ، حيثُ كتبتْ قصائدَ جميلةً عن حبِّ الوطنِ والسَّلام بين النَّاس. لم تكنْ فقط شَاعرةً، بلَ كانتْ أيضًاَ عضوةً في اتحادِ نساءِ كردستانَ، وكانت تعملُ من أجلِ حقوقِ المرأةِ.

منذ سنة 1974تنقَّلتِ الشَّاعرَةُ بينَ إيرانَ والنرويجَ، لكنها لم تنسَ وطنَها، فعادتْ إلى كردستانَ عام 2008.

في الثالثِ منْ آذارَ 2015، تُوفِّيت الشَّاعرةُ كورده نقشبندي، ودُفِنت في قريةِ تويله.

# Hin Navên bi tîpa - L

Laleş

Lewend

Lawîn

Lezgîn

Loran

Lava

Lavîn

Lîloz

Lîlav





# Ragiriya Enerjiyê
# توفيرُ الطَّاقةِ

**Ragirtina enerjiyê ger   êrka me diparêze, atmosferê xweştir dike û ji me re dibe alîkar ku jîngehê biparêzin!**
**Hevalno, hûn amade ne? Ku hûn di malên xwe de bibin lehengên ragirtina enerjiyê? Lî   ik hêsan û xweş e!**
**Dema ku hûn amûrekê an çirayekê ku hewcedariya we pê tune ye  vemirînin, hûn xalekê di   înî!**
**Ger hûn lempeyên ku hewcedari-ya we pê tune ye vemirînin; hûn xalekê zêde di   înî!**
**Ger hûn malbata xwe hişyar bikin ku xerckirina enerjiyê kêm bikin; Hûn xalên bêtir bi   înin!**
**Xalên xwe berhev bikin û serkeftina xwe bi serbilindî ragi-hînin!**

توفيرُ الطَّاقةِ يحافظُ على كوكبِنا،
ويجعلُ الجوَّ أجملَ، ويساعدُنا في حمايةِ البيئةِ!
يا أصدقاءُ، هلْ أنتم مستعدُّونَ لتُصبِحوا أبطالَ توفيرِ الطَّاقةِ في منازلكم؟ اللُّعبة سهلةٌ وممتِعةٌ!
فكُلما أطفأتَ جهازًا، أو مصباحاً، لستَ بحاجةٍ إلى ضوئه؛ تحصل على نقطةٍ!
إذا تُطفِئ المصابيحَ، التي لا حاجةَ لكَ فيها؛ تحصلُ على نقطةٍ إضافيَّةٍ!
إذا نبَّهتَ عائلتَك بتوفيرِ الطَّاقةِ؛ تحصلْ على نقاطٍ أكثرَ!
اجمعْ النِّقاطَ، وأعلِنْ فوزَك بكلِّ كِبرياءٍ!





## Tu dixwazî di siberojê de bibe çi?
## ماذا تريدُ أنْ تصبحَ فِي المُستقبلِ؟

Her yek ji me xewnek xwe ya mezin heye ku ew dixwaze bigihîje! Werin em çend heval û xeyalên wan ên xweş nas bikin:

لكلِّ واحدٍ منَّا حُلمٌ كَبيرٌ يريدُ تحقيقَه! دعُونا نتعرَّفْ على بعضِ الأصدقاءِ، وأحلامِهم الرائعةِ:



### Aşna Civan Henîfe

Ez dixwazim bibim endizyar da ku avhiyê bedew û bihêz saz bikim.

### آشنا جفان حنيفة

أريدُ أنْ أُصبحَ مهندسةً! لأُصممَّ المباني القويَّةَ والجميلةَ، حتّى أجمِّلَها.



### Kawa Dilbirîn Hac Yûsif

Ez dixwazim bibim bijîşik , ji bo alîkariya nexweşan bikim û êşa wan kêm bikim. Ez dixwazim her kes kefxweş û saxlem be.

### كاوا دلبرين حج يوسف

حُلمي أنْ أُصبحَ طبيبًا! لِأُساعدَ المرضى، وأخفِّفَ عنهم الألمَ، لأنَّني أحبُّ أنْ أرى الجميعَ بصحَّةٍ وسعادةٍ!



### Ehlam Cîhad Ehmed

Ez dixwazim bibim mamosta refê , da ku zarokan perwerde bikim. Zanîn kilîta siberojê ye.

### أحلام جهاد أحمد

أرغبُ أنْ أكونَ معلِّمةَ صفٍّ! لأساعدُ الأطفالَ على التَّعلُّمِ، وتحقيقِ أحلامِهم، فالعلمُ مفتاحُ المُستقبلِ!

# Çîroka :Pirtûka min hevalê min e







Pirtûkên dibistanê piştî we ji hêla xwendekarên din ve têne bikar anîn, ji ber vê yekê divê em wan biparêzin.
Pirtûka min di rewşeke xerab de bû, û vê yekê jî xwendina min zehmet kir.
Werin em pirtûkên xwe saz bikin û ji niha û pê de em xwedî li wan derkevin.
Ka em wê paqij bikin û bihêlin ku bibiriqînin e
Wey! Mîna ku pirtûk nû ye!
Bi vî awayî xwendekarên nû dê ji pirtûkê sûd werbigirin.


Niha pirtûkên min parastî û bedew in.
Nema em xêzikên bêsûd dinivîsin.
Ez ê li şûna tewandina rûpelan, dabeşkerên pirtûkan bikar bînim
Baş e! Hûn ji bo yên din pêşengên hêja ne
Ez pir kêfxweş im ku pirtûkên xwe di rewşa herî baş de radest bikim.
Xwendekarên nû wê bixwazin kîjan pirtûkê bikar bînin?


Xuyaye yekî baş li pirtûka xwe miqate bû! Spas ji wî re! Spas dikim hemû hevalên min
Bila em pirtûkên xwe her tim biparêzin, ew xezîneyeke giranbiha ye.
Pirtûkên dibistanê xezîneyeke ku divê were parastin da ku her kes jê sûd werbi-gire.



kozik
حَظِيرةٌ
Cowshed



Şikeft
كَهْفٌ
Cave



Hêlîn
عُشٌّ
Nest



Kun
جُحْرٌ
Hole

# Çavika Mizgîn
# عدسة مزكين



العدد 182

مجاناً

# مزكين

15-نيسان 2025

